



Sabiya Bêrman

Nameya Roja Şano ya Cîhanî 2018 Herdû Emrîka. Meksîko.

Nivîskarê Şano û Rojnamevan.

Em di karin bi pûnijin.

Êl keviran tavêje da balindeyan ji asîman bîne xwar. Dema ejdeha agirê devê xwe tavêje û Barînê dike, û di heman demê de çaxê mirovên hurik barînê wek ejdeha dikin, wê gavê herkes di reve.

Barîna wek ejdehayekî ji hêla miroveke jin ve, ez dixwazim wê wek jinekekê berçav bikim- ewe tiştê resen ku dihêle em wekî rastiya xwe xuyabin, hin cûreyên din hene di karin zarîkirina tiştên din jî bikin ku em nikarin wê yekê bikin, û cûreya ku dikare zarîkirina (teqlîda) kesên din bike.

Rê bidin em gavna bavêjin û 10 salan, an 100î an hezarî bi pêş ve herin. Êlê ew fêrî çawaniya zarîkirina ajalên din kiribû, di şikeftên kûr de, li ber gurbûna ronahiya agir, çar mêr ejdeha ne, sê jin çemin, mêr û jin balinde, meymûn, dar, û ewrin: Êl bi dûv nêçîra beyaniya lîstikvaniya xwe ketiye, û wisa ew kevnetoriya xwe li gel diyariya Şanogeriyê bi bîr tînin. Tiştê herî balkêş ewe: Ku Êl hertîştî ji bo pêşerojê pêk tîne da ejdeha yê ku dijminê êlê ye bişkînin.

Kezî, Barîn, fikandin, dumdum, qîjîn, yên Şanoya meya sereke, wê bibin zimanekî devokî. Ê zimanê bi lêvkirî wê bibe zimanekî nivîskî. Li bin rêçeke din, Şano dê bibe kultûr, û paş wê sînema.

Lê li gorî van rengên dawî, û di sîsika her regekî ji wan rengên vê dawiyê de, Şano dê her regekî hesan ji lîstikvaniyê re bimîne û ew dê her ew lîstikvaniya vejînî ya tekane bimîne.

Şano: ew hesantirîn û bi hêztirîn hûnandina ku me bihtir bi jêhatîbûna hemî hunerên mirovan ve girê dide.

Îro em li tevahiya Şanoyên cîhanê ahengê bi jêhatîbûna mirovan bi pêkanîna vê lîstikvaniya pîroz dikin, em dema berê bi bîrtînin û pêşerojê nû di aferînin, di be ku ew azadiyê û Şanaziyê ji bo Êlê bihtir peyda bikin.

Lê gelo Îro roj çî ejdeha hene ku pêwîste Êlên mirovan wan bişkînin? Dijminên wêyî serdemê kîne? Derbarî çî hebûna Şano pêwîste li dar be, da ku bihtir daxazan cî be cî bike, ne tenê ji bo kêfxweşiyên be?.

Ji bo min Girîngtirîn ejdeha ku ji her tiştê din xuya tire ji hev dûrketina di dilê mirovan de ye, windabûna hevparkirina hestan bi kesên dinre ye, da bi birayên xweyî mirov re hesta vînahiyê hebe, hevdem bi rengên jiyanê yê ne mirovî re jî.

Çi cudahî îro li ser beravên dawîya mirovayetiye hene -ji navenda mirovahiyê- ji cihê wê serdema ku mirovan bi hêza surîştî Exter a me bihtir guherîn, û emê li ser vê yekê her berdewam bin. Li gor nerîna min erkê Şano ewe ku ne wek wî kesê ji Êlê xelk li dawîya şikeftê di danehev, îro pêwîste têkiliyên me bi cîhana normal re hebin.

Bihtir ji Wêje, û bihtir ji Sînema, Şano daxwaza hebûna mirovan dike berya hebûna hin mirovên din û ev derfeteke ji bo me bi parêze da em nebin ji Xewarizmiyên tam û xuya.

Ka werin em her tiştên ne pêwîst ji Şanoyê rakin, werin em wê şilfî tazî kin, ji ber Şanoya sade baş tire, ewê tiştê ku nayên veşartin bîne bîra me, ev emin, di heman demê de em goşt û hestîne, ev dil di sînga mede lê dixê, ev emin, li vir û anuha, û ne bihtir.

Her bijî Şano, kevintirîn huner, hunera dema anuha, balkêştirîn huner.
Her bijî Şano.

Werger ji Ingilîzî
Lawîn Şêxo.

Koma Şano/ Qamişlo